



HÊVI

Kovara Kurdi ya zarokan

Hejmar 8 Îlon 1981






HÊVI

Kovara Kurdi ya zarokan

TEXISTINÎ

Payız.....	2
Payız(Şemsi).....	4
Alıyên Nabên	5
Kevok û Rûvi	9
Elık,Fatık,û Manga Belek.....	11
J1 ABDULLAH Peşew du helbest....	14
Gelo hûn van tiştan dinasin?....	16



PAYİZ

Meha İlonê bı demsala Payızê destpêkır.
 Germa havinê êdi nema .Ba û baran destpê-
 dıke. Pelên daran hemû zer bûn. Bı baki pırr
 hêdi pelên daran diweşın. Rengê dinê tê gu-
 hartın û hêşnayı (şinayi) namine. Mêrg û çî-
 men tev zer dıbn.

Koçerên ku havinê barkırıbûn çûbûn zozan,
 icar xwe berdidın deştê.

Xwediyên rezan dıms û helil, bastiq û be-
 nıyan çêdikın û jı bo zıvıstanê vedişêrın.
 Lı hın cıyan beniyê hejıran jı çêdikın.

Gundi û bajari tev de dest bî hazırıya zıvıstanê dıkın, ku jî serma neqe-fılın. Malan radıxın. Lî hın alıyên Kurdistanê, gundi çılo û daran jêdıkın, dıbin bajêr dıfroşın. Weki hûn jî dızanin jêkırına (bırına) dar û çılo jî bo welatê me zırar e. Lê gundi jî tunebûnê mecbûr dıbin wan jêdıkın Çûkên demsali weki legleg, quling û hec-hecikan (duvmeqesk) berê xwe dıdın başûr, cıyên germ û bî rojan dıfırın. Ferxên wan jî dıdın pey (dû) wan. Bî destpêka bîharê disa dızıvırın tên cıyên xwe.

Cotkar dest bî cotên xwe dıkın. Çalên tovan vedıkın. Yek cot dıke, yek jî tov dıreşine. Dema tov tê reşandın, çûkên der û dorê, nemaze qıjık lî erdê ku cot dıbe kom dıbin. Dıxwazın tovê reşandi bıxwın.

Pışti barana yekem a payızê, xelq xwê dı reşının banê xanıyan. Pışti reşandına xwê, lox (bangeran) dıkın. Pışti loxkırınê, kayê lî banê dıreşının. Van tıştan dıkın ku de ma baran bê, xani dılopan nekin.



(Şemsi)

PAYİZ

Ewr û ezman,mıj û dûman
Gaz û gêdûk bı berfa pûk,
Sur û serma dıkevne çiya,
Kulilk,beybûn,gul çı hebûn,
Seri lê xwar,dılı xedar...
Kani bê dıl,bê xule-xul,
Çemê gujin dihênjin,
Gur lı banıya bı peranıya,
Keri-begêl mane metel...
Pez û pezbêr daketıne jêr,
Dest û aran hûr-hûr baran,
Disa şıvan,beran berdan,
Belgê dana lı qeraya,
Bostan tazi,av lê bezi,
Lawkê dengbêj,şevê dirêj,
Şerab,karas,dawet,hewas...

(Jı pırtûka ZIMANE KURDÎ a
dersxana 4'a-Ordixanê Celil)

ALİYÊN NABÊN.

Şeveke zivistanê bû. Xezal û Şêro, lî mal , lî nîk-diya xwe rûniştibûn. Diya wan, jî aliki ve jî wan re lepik çêdikir û jî aliki ve jî xewroşkan digot. Bavê wan jî, lî radyoyê guhda ri dikir. Şêro û Xezalê demekê devên xwe kirin kerika guhên hev û bû kur û pîsa wan. Pê vê şêwrê re, Xezalê berê xwe bî bavê xwe de kir û got;

-Bavo, ger tu hêrs nebi, ez ê tiştêki jî te re bêjim?

Bavê wê;

-Na, keça min a delal, ma çima ez ê hêrs bîm? Ka çiyê, hela jî bavê xwe re bêje.

Xezalê di pey vê soza bavê xwe re, berê xwe bî Şêro de kir û serê xwe jê re leqand . Pê re herduyan, bî rûyekî kenok, bî tundan xwe gihandin cem bavê xwe. Bavê wan her yek da kê lekeke xwe û destên xwe di hustiyên wan re bîr û bî wan şa bû. Pê re got;

-De bêjin daxwaza we jî min çî bû?

Xezal;


-Em jî zûdeye, ku neçûne mala Berfê. Ez û Şêro, dixwazî sibê herin mala Berfê.

Bavê wan;

-Keça min, tu zani ku mala Berfê hîni-ki dûr e. Belbî sibê dinya şîli be jî.

Şêro;

-Na, na wele dinya wê xweş be, sibê baran tune.



Bavê wan destê xwe di serê wan da û got;
 -Bisekînin, wê niha radyo rapora hewê bide. Ger radyo bibêje, sibê wê dinya xweş be, wê çaxê herin. Ez, we jî riya we nakim. Lê bîstekê sebîr kî, wê du deqê dîn şandiyar (spiker) rapora hewê bide.

Dema bavê wan wîlo got, herduyan jî dev jî axaftinê berdan û guhên xwe miç kîrin, dan ser radyoyê. Wer jî xwe derbas bûbûn ku, bê dengê radyoyê tu tiştê nedibîhistin. Ew herdu deqana, jî wan re, mîna du salan dirêj hatibûn Hew carê bîhistin ku, radyoyê got, "tut, tut, tut" û pê re şandiyar got; "Seet 19'ê êvarê .

Ez dest b1 rapora hewê dikim." Bê sebriya wan hin ji zêde bû û hinkî dîn xwe ber b1 radyoyê kışandin.

Şandiyar;

-Sibê wê her çar aliyê welêt ji b1 ewr be Bakura rojhilat wê pê nivro b1 xunavi derbas be. Başûra rajhilat ji, wê j1 destê sibê heta êvarê b1 baran be.

Dema şandiyar got, "wê Başûra rojhilat sibê b1 baran be" Şêro êdî l1 benda xeberan û qedandinê ji nema, tavilê vegeriya ser xezalê û jê re got:

-Vaye wê sibê baran b1bare.

Xezal;

-Ez tê neghiştim, "başûra rojhilat" çiyê? Ez b1 rojhilat, rojava, bakur û başûr dizanim, lê belê evên nuha şandiyar gotin nizanim çine. Ka hûn ki zanin j1 min re bêjin?

L1 ser vê axaftina Xezalê, bavê wê got;

-Ez ê j1 keça xwe re bibêjim. Weke te ji got, çar aliyê me yê himî hene, waye tu navê wan ji dizani. Lê belê, j1b1 van her çar aliyên çar aliyên dîn yên nabên ji hene. Navên wan ji ev in:

BAKURA ROJAVA

BAKURA ROJHILAT

BAŞÛRA ROJHILAT

BAŞÛRA ROJAVA

Gundê me ji d1 nav başûra rojhilat de ye. J1 bo vê yekê, dema başûra rojhilat b1 baran be, dibê wê l1 gundê me j1baran b1bare.

Şêro;

-Rast e, mamostê me ji, j1 me re wilo goti-

bû û navê her çar aliyan ji bî me dabû hinkirin
Xezal, pêwîste ku tu ji navê wan hin bibi.

Xezal;

-Spas ji bona van agahdariyên we. Lê sozê
bî me de, ku roja, roj xweş be ez û Şêro em ê
herin mala Berfê. Bavê wan;

-Soz ji we re, kujan rojê xweş bû herin.



Kevok û Rûvi

Rojeke rûviyek pîr birçi bû. Jî birçina dîlê wî dîxewrî. Demekê fikirî, jî xwe re go:

"Bî rûniştinê qîsmet nayê ber nigê kesî. Pêwîste ku ez jî xwe ra derkevîm nêçirê."

Rabû bî rê ket. Pîr çû hîndîk çû, gîhaşt qeraxa bestekê. Mêzekîr çend kevok lî wê venîştine û avê veduxwîn. Rûvi xwe qelîzand jî nişkavê avêt ser kevokekê, wê girt.

Hin kevok ne xawribû,kevokê jî rovi re got;

"Bîrayê rûvi,vaye te ez girtim û tuyê min bixwi.Lê belê beri ku tu min bixwi ez dixwazim bîzanîbim tu jîkijan malbatêyi? Dax waza min beri ku tu min bixwi eve."

Rûvi daxwaza kevokê qebûl kir û got;

"Ez baaayîki me."

Gava go,ez bayîki me devê wi jî hev ve-bû û kevokê go pirt û fîrya.

Kevokê xwe xelas kiribû.Rûvi bî haleki şaşbûyi û şeqîzi lê nihêrt û got;

"Ger min zanîbûna,minê diranê xwe di hev de bîqırçandana û bigota;

"Ez qerrregêçi me,qerrregêçi me!"


Lê belê kevok xelas bûbû.



Elik, Fatik û Manga Belek

Hebû, tunebû... Carekê jî caran, xwişk û bî raki hebûn. Navê lawîk Elik û yê xwişka wi jî Fatik bû. Dê û bavê wan mîribûn, ew hê jî zarokî de sêwi mabûn. Hê dî xweşiya dê û bavê de jî mala wan pîr naçar bû û lê pişti mîrina wan, neçari û feqiriya wan idi nedihat kîşandin. Halê wan gelek dijwar bûbû. Jî dê û bavê hew mangel belek jî wan re mabû.

Elik û Fatik hê gava nuh sêwi man, him jî kerba mîrina dê û bavê û him jî jî neçari bêkesi û bêxweditiya xwe sê roj û sê şevan dî afirê Manga Belek de rûniştin û dan giri.



Wê gavê Manga Belek hat zman û bî wan re a-
kaft;

"Elîk û Fatîka mîn, biçûkên mîn ên hêja! Ev
sê roj û sê şevîn hûn hertim digirin. Ka jî
mîn re bêjin, derdê we çî ye? Hûn jî xwe bî
şîn bûn, we eza reben jî helak kîrîm."

Elîk û Fatîkê jî Manga Belek re qala mî-
rîna dê û bavê xwe kîrîn. Yekî gotinê jî devê
a dîn birî û bî giri herduyan jî jî Mange Be-
lek re gotin;

"Ma em negrin,ki bigri!..Em herdu ji di vê jina xwe ya zaroti li panavê bêkes û bê-xwedi man.Em çî bikin,bî ku de herin?.."

Manga Belek dişa hat zman û ji wan re got;

"Bî gri û şinê hûn tişteki bî dest xwe naxinin.Heta ji dest we tê,bixebitîn,mîn bê giya û alif nehêlîn.Gava hûn birçî bûn ji,we rîn guhanên min bimişin.Wê gavê tu tişt bî we nabe.

Elik û Fatik'ê liiser van peyvên Manga Belek,destpêkîrîn;her roj yan manga xwe derxistî çêrê,yan ji ji çolê nefel,şirame û êmên dîn ên xweş didan hev,êvaran bî xwe re danin mal,didan ber Manga Belek.Paşê ji şirê wê dimêtî,heta zikê xwe têr dikîrîn.Bî vi hali Elik û Fatik'ê,roj bî roj can dîgirtî,xurt dibûn û ji hevalên xwe bêtir bejn direvandin.

(Dûmahik heye)

JI ABDULLAH PEŞEW DU HELBEST:

SERBAZÊ WIN

(mechûl esker)

Ku wefdek diçe şûnê
Bo ser gora serbazê win
Tacegulekê datine.

Eger sibê

Wefdek bê welatê mîn

Jî mîn bîpirse:

"Kani gora serbazê win?"

Dibêm:

-Ezbeni!

Lî rexê her cuhê

Lî ser sekûya her mîzgeftê

Lî ber deriyê

Her malê,

Her dêrê,

Her şkeftê,

Lî ser zînarê her şaxi,

Lî ser mêwa her baxi,

Lî Kurdistan

Lî ser her bîhust zeminê

Lî jêr her gazê asiman,

Metirse!

Pîçek seri daxe û

Tacegulê deyne!

TEERİB

J1 asimana nehatıme
Ez ne mêvanım
Ez mêvanê
Sigıranê Kurdistan ninım
J1 zê ve
Kaniyek bûm, lı vır derbûm
J1 zû ve
Agırek bûm, lı vır gur bûm.

Barkın bıçın!
Van kaniyan j1 bili mın
Keseki tır têr av nakın
Darên gwızan j1 bili mın
Bo hiç kesek
Siyên xwe hılınaxın.
Barkın bıçın!
Zeviyê me
Danê we lê şın nabe
Mêrga me
Lı jêr piyê garanên we wek agırın
Heta darên me yên tuya jı asi dıbin
Hêlekanek bo mındalên we ranagırın.

Barkın bıçın!
Fêkiyê mewa me kal e
Ava me şor e
Hıngıvê me bı devê we tal e
Barkın bıçın
Barkın bıçın....!

GELO HUN VAN TIŞTAN DINASIN ?

Hevalên hêja

Lî jêr hin wêne hene. Gelo hun dikarin wan
bînasîn û navên wan lî bîni bînivîsîn.



ISSN: 0280-0241



HÊVÎ: Kovara Kurdi ya zarokan / Kurdish children magazine / Kurdisk
barn tidning * ADRESS / NAVNÎŞAN: Hêvi: BOX 5034 163 05 Spånga-
SWEDEN. * PRIS / BÛHA: 5 Kronor. * SUBSCRIPTION / ABONE: 40
Kronor per år, 20 kr. per 6 månader. * POSTGIRO: 439 33 42-3